

Ber bi stratejîyeke geşepêdana aborîya xwecihî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ve

Navenda Firat a lêkolînan

Wergera ji Erebî: Mistefa Mistefa

Pêşgotin

Dosyayên geşepêdanê ku xwe dispêrin liv û tevgera civakê û peydakirina rêyên pêşdeçûn û pêşketinên aborî, di aborîyên pêşketî, paşmayî û yên ber bi pêşketinê ve de, xwedî alîyekî stratejîk ê rasteqîn in.

Eger em bîn li projeya geşepêdana aborî weke plansazîyeke xebitînê ya mezin û giştî meyze bikin, wê demê gerek e derfet û karînen li ber dest bîn destnîşankirin, û rewşa heyî ya aborîyê ji alîyê nîşaneyên geşepêdanê yên tê de û tevaya dahatên aborî binirxînin, û van dahatan ji bo başkirina rewşa aborî û civakî, her wiha geşedana beşên xizmetguzarî, berhemdayîn û civakî terxan bikin. Bi vê yekê dê ewlehîya aborî li civakê bê mîsogerkirin û asta başbûna aborî bilind bibe.

Rêya geşepêdanê li ser me ferz dike ku armanc û tercîh bîn destnîşankirin, her wiha divê stratejî û sîyasetên geşepêdanê bîn danîn û di ber bihêzkirina binesazîya aborîyê de ku bibe bingehek ji geşepêdana aborî û civakî li herêmê, pêwîst e gelek planên pêşketî bîn cîbicîanîn. Ev yek bi rêya qezenckirina dahat û şîyanên ku beşên aborîyê yên sereke weke çandinî û bazirganîyê baştir dikin, pêkan e, her wisa bikaranîna rê û sîyasetên ku girîngîya wan beşan a aborî bihêztir dike û bandora wan a di berhemdayîna xwecihî li herêmê zêdetir dike û alîyê pîşesazîyê baş û ber bi pêş ve dibe, ev hemû dê di berjewendîya peydabûna kelûpelên sereke li bazarê û derfeta dev ji hawirde berdanê de bin.

Di vê çarçoveyê de, mijara bidestxistina ewlehîya xwarinê yek ji giringtirîn tercîhên pêşketinê ye, û ew yek ji giringtirîn mijarên ku pêwîstî bi balkişandina zêdetir heye, ji ber bandorên neyênî yên alozîya Sûrîyayê li ser rewşa jîyanê, û zêdebûna rêjeya xizanîyê di nava civakê de.

Lewra, bipêşxistin û cîbicîanîna planên geşepêdanê yên taybet bi beşê çandinîyê, dê mîna dergeheke girîng a ber bi peyakirina berhemên xwarinê yên sereke û başkirina rewşa jîyanî û bidestxistina xwestekên cîbicîanîna sîyasteyên weberhênana di çarçoveya palnên geşepêdanê de be, ku bi vê yekê wê ewlehîya xwarinê li herêmê pêk were û dê şerê hemû rengên xizanî bike û rêjeya wê li kêmê bixe.

Pirsgirêka Lêkolînê

Di nava guhertinên sîyasî û aborî ku di van salên dawîn de li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê rû dan de, ku di encamê de Rêveberîya Xweser hemû dahatên aborî yên li herêmê kirin destê xwe û weberhênana wan di ber pêşkêşkirina xizmetguzariya giştî de kir, her wiha dabînkirina lêçûnên îdarî û leşkerî, Rêveberî rastî gelek astengî û zehmetîyan hat, nemaze di milê danîna planên geşepêdanê û cîbicîanîna wan de, her wisa lêgerîna li derfetên bipêşxistina rewşa aborî, ku di encama kêmpaydabûna pisporên aborî de hat. li rex wê jî, Rêveberîyê di destpêka xwe de, di xebatên aborî de xwe sparte kesên ne pispor, îcarê li vir em dikarin pirsgirêka lêkolînê bi van pirsan rave bikin:

- Gelo di rewşa aborî û weberhênana dahatên li ber dest de, li herêmê, Rêveberîya Xweser -weke rêyekê- xwe spartiyê plansazîyên aborî yên zanistî?
- Pûtepêdana Rêveberîya Xweser bi rewşa geşepêdana sektoran zêdetir bû?
- Gelo Rêveberîya Xweser ti nîşaneyên serjimarî yên geşepêdanî ragihandine, weke rêjeya bipêşketinê yan qebareya werberhênanê yan jî ketinaserhevî ya sermayeyî û ji bilî wan, ku bi rêya wan biserketina rêbazên tîk bikaranîn, di çarçoveya rewşa aborî ya sektorî bi awayekî taybet û geşepêdanê bi awayekî giştî li herêmê, bê destnîşankirin?

Armancên Lêkolînê:

- Danasîna stratejîya geşepêdanê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.
- Dazanîna derfet û karînen heyî, yên başkirina jîngeha xebatan û peydakirina derfetên karî.
- Girîngdayîna bi geşepêdana sektorî, li ser esasê beşdariya di navbera tevaya binesazîyên civakî û aborî li herêmê.

Ferezîyên Lêkolînê

- Rewşa aborî bi dûrî çarçoveyên stratejî û planên aborî ye.
- Li gel berhevkirina bi asta peydabûna dahatên aborî yê pêwîst, lawazîya encamên heşepêdanî yê cîbicîkirî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.
- Ji bo pêkanîna geşepêdana sektorî weke dergeheke bingehîn a geşepêdana aborî û civakî li herêmê, xwesipartina li hêmanên hevbeşdarîyê.

Naveroka Lêkolînê

Rêvekirin

Beşa yekem: Danasîna Geşepêdana Aborî û Armancên wê

Yek- Danasîna geşepêdana aborî

Du- wateya geşbûna aborî

Sê- Armancên geşepêdana aborî

Beşa Duyem: Pêdivîyên Palnsazîya Xwecihî û Geşepêdana Sektorî

Yek- Taybetmendîyên aborîya xwecihî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Du- Sedem û pêdivîyên girîng ên encamdana geşepêdana xwecihî

Beşa Sêyem: Stratejîyên Geşepêdanî yê Vekirî

Yek- Geşepêdana sektorî

Du- Qonax û gavên plankirina stratejî yê geşepêdanê, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.

Encam û Pêşinyar

Rêvekirin

Aborîya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, aborîyeke nûhatî ye. Piştî ku sazîyên Rêveberîya Xweser dahatên aborî yê li herêmê kirin jêr dest xwe, bi taybet çavkanîyên enerjîyê weke xaz û petrolê, û tevî ku ji mêj ve binesazîya herêmê ji rê, torên av û kehrebeyê, pir, bendav, stasyonên kehrebeyê, torên pêwendîyan û sazî û avahîyên îdarî hebûn, lê bi dirêjahîya salên şer re, rêjeyeke mezin ji wan xera bûn û karîna jinûvexebitîna wan an bipêşxistina wan ji ber gelek sedeman tune bû.

Lewra, em dikarin bibêjin ku Rêveberîya Xweser di milê aborî de ne ji sifir dest pê kir û tevî wê jî, heta roja me ya niha ti pêşketineke aborî ya berbiçav encam nedaye, her wekî projeyên mezin an başkirina binasazîya heyî, lê berevajî wê, li herêmê dem bi dem alozî xwe didin der, çî yê girêdayî sotemenîyê bin, çî jî yê girêdayî kelûpelên sereke weke nan, şeker û ji bilî wan. Ev yek li gel rêjeyên bilind yê enflasyonê û jinavçyîna karîna welatîyan a kirînê.

Ev yek tenê nêrînekê derdixe holê; ku Rêveberîya Xweser di encama rewşên ewlehîyê yê li Sûrîyayê bi giştî û li herêmên Bakur û Rojhilatê wê bi taybet, nedikarî stratejîyên aborî yê rasteqîn bi rê ve bibe, da ku planên geşepêdanî yê bi armanca bipêşxistina aborîya herêmê deyîne.. lê tevî ku ev buhane bihêz in jî, em dikarin bibêjin ku qebareya dahatên aborî yê li cem Rêveberîya Xweser dikarîbûn bi barê bipêşxistina herêmê ji alîyê aborî û civakî ve heta astekê rake, weke rêgirtina li ber rêjeyên xizanî û bêkarîyê bi rêya başkirina rewşa jîyanî ya aborî li herêmê, ev yek jî, eger ew dahat bi awayekî gunçaw bi kar bianîya û projeyên geşepêdanî yê astbilind li dar bixista, her wiha bi kualîteyê aborî ya herî baş bi kar bianîya.

Di vê lêkolînê de û di vê rewşa aborî û ewlehîyê ya heyî de, em dikarin hemû makanîzme û sîyasetên geşepêdanê yê girîng vekolin, ku bi rêya wan em dikarin aborîya herêmê binin ser rêya geşepêdana aborî û civakî ya giştalî, ew jî li gorî me, bi rêya danîna planên geşepêdanî û pêşketî yê xwecihî li ser esasê hevbeşîyê û di çarçoveya planeke arasteyî ya giştalî û neferzkirî pêkan e, ev plan dê şîyan û dahatên aborî yê liberdest destnîşan bike û li ser sektorên aborî yê sereke li gorî tercîhên geşepêdana aborî û weberhênana saxlem belav bike.

Beşa Yekem: Danasîna Geşepêdana Aborî û Armancên wê

Di gengeşîya li ser têgiha Geşepêdana aborî de, gelek aborînas di mijara destnîşankirina ka gelo geşepêdan navgîneke pêkanîna komê armancên lihevkomûyî ye weke rehetîya aborî, aramî û avakirina bingehe pêşketinê, yan jî ew bi xwe proseyêke pêkanîna guhertinên bingehe di çarçoveyên civakî yê cuda de ye ku alavên pêwîst yê pêşxistinê bi xwe re tîne ye?

Bi rêya vê gengeşeyê, em dikarin rola çalak a ku pêkan e geşepêdan di nava civakên mirovahîyê de bilîze bibînin, çî ku proseyêke bi serê xwe be, çî jî ku navgîneke pêkanîna gelek armancan be, çîmkî di encamê de û di

herdu rewşan de dê guhertineke bingehîn ya xwestî bi xwe re bîne û bi vê yekî dê rewşa aborî ya rawestîyayî ji nav bibe, ev rewşa ku bingeha gelek pirsgirêkên aborî, civakî û siyasî ye.

Yek: Danasîna Geşepêdana Aborî

Danasînên girêdayî geşepêdana aborî vedigerin rewşa giştî ya aborîya niştîmanî û nîşaneyên wê yên sereke, îcarê eger berhemdayîna xwecihî berûapaş vedigere, wê demê em dikarin bibêjin ku geşepêdana aborî proseyek e ku bi rêya wê astên geşbûna aborî bi armanca zêdekirina berhemdayîna xwecihî zêdetir bike ye, û di encamê de para her kesî ji dahata niştîmanî zêdetir dibe.

Lê eger rêjeya bêkarîyê û asta enflasyonê bilindtir bibe û hejmara hejran zêde bibe, wê demê em dikarin bibêjin ku geşepêdana aborî, proseyeke ku bi rêya wê rêjeya enflasyon û bêkarîyê li kêmê dikeve ye û edalet di biparvekirina dahata niştîmanî de bi cih tine, bi rêya bihêzkirina binesazîya berhemdayîne û destekdayîna projeyên weberhênanê, ku ev bi xwe dikarin derfetên kar peyda bikin û dahatê bi par ve bikin, û pê re bazar çalak bibin û xwestîyên çalak bîn livandin.

Di rewşa zêdexerckirina çavkanîyên liberdest û bilindbûna rêjeya gendelîya îdarî de, em dikarin wiha geşepêdana aborî pênase bikin, ku ew proseyeke bi rêya wê hemû çavkanîyên aborî li welêt bi awayekî guncaw tîr qezenckirin û bikaranîn, ew jî bi armanca bidestxistina qebareyeke mezin a berheman û bi lêçûneke aborî ya bi makenîzmeyên çavdêrîyê û nirxandina rasteqîn re hevçax bin, pê re rê li ber gendelîya ku rêjeya lêçûnê bilind dike û karîna kirîne li bazarê sînordar dike bê girtin.

Li gorî tiştên me li jor gotî, em dikarin bibêjin ku geşepêdana aborî proseyeke xwedî armanca guheztina ji rewşa civakî ya heyî ber bi rewşeke aborî û civakî ya astbilind ve, ew jî bi xwespartina li planeke aborî û bichanîna sîyasetên aborî yên saxlem û rêkarên birêveberî û cîbicîkar, ên xwedî armanca seferberkirina çavakîyên liberdest û terxankirina wan bi awayê herî baş ji bo bilindkirina asta geşbûna aborîyê, başkirina nîşaneyên aborî yên giştî û pêkanîna rehetîyê di hundirê civakê de.

Bi pênaseya borî ve, em dikarin bibêjin ku geşepêdana aborî proseyeke civakî ye ku tenê bi yek sektoreyî yan sazîyek birêkûpêk ve nayê sînordarkirin, lê li ser bingeha beşdarîya çalak a hemî yekeyên aborî yên heyî di civakê de, kes, sazî, rêxistinên karsazîyê û hikûmet û her wiha li ser

bingehên zanistî ku xwe dispêrin plansazîyên aborî yên saxlem da ku armancên xwe bi cih bîne.

Du- Wateya Geşepêdana Aborî

Di dema axaftina di derbarê geşepêdana aborî de, girîng e ku cihêwazî di navbera wateya wê û wateya geşbûna aborî de bê kirin, ku ya dawîn tê wateya zêdebûna berdewam a berhemdayîna xwecihî yan dahata neteweyî ya rasteqîn, ku di encamê de para navînî ya kesekî ji dahata neteweyî ya rasteqîn zêdetir dibe"¹. Bi vê yekê em dikarin bibêjin ku geşbûna aborî weke wate tenê vedigere guhertinên nîşaneyên aborîya giştî, weke dahateke niştîmanî û para kesekî jê ber bi zêdebûnê ve, lê geşedana aborî xwe disperse pêkanîna guhertinan di binesazîya aborîya niştîmanî, bihêzkirina wê, cihêrengkirina çavkanîyên dahata wê û pêkanîna edaletê di biparvekirinê de, ji bo veguheztina bo rewşeke baştir.

Sê-Armancên Geşepêdana Aborî

Ger em xwe bispêrin têgiha geşepêdana aborî, wekî proseyeke ku armanc dike rewşa aborî ji asta wê ya niha ber bi asteke bilindtir ve bibe, bi hewldana guhertinên pêkhatî di nav aborîya niştîmanî de, bihêzkirina sektora berhemdayînê di wê de, cihêrengkirina dahat û jêderên wê, û bipêşxistina alav û rêbazên hilberînê; wê demê em dikarin hin armancên geşepêdana aborî destnîşan bikin:

- 1- Bicihkirina çavkanîyên berdest û bi kar anîna wan di warên weberhênanê yên bikêrhatî de, bi awayekî ku bibe sedema peydakirina derfetên kar, û di serî de berhemdayîna kelûpel û madeyên sereke, û bi vî awayî pêkhatina nirxên lêzêdekirî, ku bi rêya wan proseyên jinûve-hilberandinê bêne kirin, û rêbazên wê bi berdewamî bi pêş bikevin
- 2- Bihêzkirina binesazîya heykelî ya aborîya niştîmanî ku projeyên binesazîyê, bicihanîn û bipêşxistina projeyên hilberandinê, û bipêşxistina sektorên sereke bi awayekî biplane yên dikarin bigihin asteke aborî ya bilind, di nava xwe de dihewîne.
- 3- Bi zêdekirina rêjeyên weberhênanê, û danîna projeyan re, çavkanîyên dahatê zêde û cihêreng dibin, bi vî awayî zêdebûna berdewam di dahata

¹ Mohamed Abdel Aziz Acamia, El-Tenimiya El-Îqtîsadiya (Têgeh û Taybetmendî – Teoriyên Stratejîk-Pirsgirêk) - Fakulteya Bazirganiyê - Zanîngeha Îskenderiyê - Pirtûkxaneya Terîq El-Îlim - Cotmeh 2008 - R76

navîn a kesan de misoger dibe, ku pê re tevgera berdewam di bazaran de jî tê misogerkirin, ji ber başbûna asta daxwazîya giştî, û bi vî awayî, damezrandina projeyên weberhênanê yên nû, yan berfirehkirina yên heyî handan dike.

- 4- Zêdebûna projeyên hilberînê dikarin kelûpelan li bazarê peyda bikin û di encamê de, pêwîstîyên kesan ji alîyekî ve dabîn bike û ji alîyekî din ve dê xwesipartina li ser hawirdeyan kêr bike û bi vê yekê, dê qebareya pereyên bîyanî peydatir bibe ku bi rêya wan dikarin projeyên hilberînê yên ku nîrxê zêdebûyî bi cih tînin bînin saz bikin.
- 5- Bi dabînkirina berdewam a di milên aborî û civakî de, dê karîna û enjîna mirovan zêdetir bibe û asta xebitîna wan a aborî bilindtir bibe, her wiha dê karîna bi awayekî baştir beşdarî proseya hilberînê bibin, li rex başkirina dahata wan a madî û di encamê de dê rewşa jîyanî ber bi başbûnê bi rê ve biçe.
- 6- Geşepêdana aborî dikare rê li ber rewşên paşmayî û dîyardeyên wê bigire, ew jî bi rêya bicihanîna sîyasetên aborî yên saxlem û qezenckirina baş a çavkanîyên li ber dest û pê re dê asta jîyana kesan bilind bibe û hejarî ji nav biçe.
- 7- Geşepêdana aborî bi xwesipartina li plansazîyên saxlem û bicihanîna astên bilind ên geşbûnê, û cîbicîanîna weberhênanan û bipêşxistina xebatên îdarî, dixwaze rewşeke pêşketî ne tenê li ser asta aborî, lê belê li ser asta peydakirina jêrzemînekê bi rêya bipêşxistina tevaya alîyên jîyanê yên civakî, çandî û jîngehî bi cih bike.

Beşa duyem: Plansazîya xwecihî û geşepêdana aborî

Rêveberîya Xweser li gorî derfetên xwe li ser avakirina zemîneke aborî ku dibe bibe destpêka danîna herêmê li ser rêya geşepêdana aborî, dixebite. Ev xebat jî bi rêya bipêşxistina desteyên ku serperîştîya rewşa aborî ya giştî dikin, her wiha bi rêya danîna qanûnên jîyana aborî birêkûpêk dikin pêkan e, her wekî qanûnên bacê, weberhênan, bazirganî û ji bilî wan.. bi vê yekê hewl dide ji zanînen derveyî sîûdê werbigire da ku bîngehên saxlem ên bi rêya wan proseya geşepêdana aborî bi awayekî taybet bi rê dikeve û di demên bê de proseya aborî bi awayekî giştî bi rê bikeve. Ev yek helbet hewcedarê jêhatîyên aborî û îdarî yên guncaw û xwedî asteke pisporîyê ya bilind e, ku karîbe li gorî rewşa aborî tev bigere, bîngehên bipêşveçûnê deyne û ber bi bîchanîna geşepêdana xwestî ve biçe.

Tevî ku Rêveberîya Xweser aborîya xwe bi aborîya civakî bi nav dike, lê heta niha di vî warî de wê ti gavên rasteqîn neavêtine. Bi awayekî giştî, em nikarin taybetîyên sereke yên aborîya xwecihî ya Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê binirxînin, ev taybetîyên ku bi rêya wan dikarin destnîşan bikin ka gelo aborîya Rêveberîya Xweser piştî xwe dide plangerîyê yan hêza bazarê yan jî wan herduyan tevlihev dike.

Em nikarin bi ti awayî mekanîzme û formên wan ku di aborîya xwecihî de tîn bikaranîn li gorî formên navborî bibînin, sedema sereke jî ew ku cîhazekî birêveber ê aborî yê rastîn tune ye, ku ev cîhaz bi rewşên plangerîyê û arastekirina wan li gorî rewşa heyî ya li herêmê rabe, li nik wê jî, nebûna avanîya birêveberî ya hevtemamkirî û taybet bi aborîyê ku dikare guhertinên bingehîn di warên aborî û civakî de çêbike.

Her wiha rewşa ewlekarîya nêram, û keysbazîya hêzên sîyasî ji çavkanîyên liberdest sedemine dikarin li ber çavan bînin standin, çimkî nêaramîya sîyasî ji bo bîchanîna planên geşepêdanê nabe alîkar.

Yek- Taybetmendîyên aborîya xwecihî li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Tevî ku pirranîya çavkanîyên aborî li welêt, li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ne, lê berîya ku bikevin jêr kontrola Rêveberîya Xweser de, di milê berhemdarîyê de gelek zerer di sektorên aborî yên sereke de dîtin, ev yek li rex kêşana pirranîya encam û berhemên wan sektoran ji kelûpel, madeyên stratejîk weke petrol û genm ber bi herêmên hundirê Sûrîyayê ve û destnîşannekirina rêjeyeke gunçaw ji van berheman jib o jinûvehilberîneke saxlem, û geşkirina herêmê, di encamê de, asta xebitîna aborî berûpaş vedigere û astên geşbûnê nagihin astên xwestî.

Vê yekê bandorên aborî û civakî yên berdewam li ser herêmê û niştecihên wê kir, ku bi kêmbûna asta dahatê, rêjeya bilind a bêkarîyê, û zêdebûna pêlên koçberîya navxweyî û derve ji herêmê, ji bo peydakirina jîyaneke baştir, bi xwe re anîn. Sedema vê yekê jî lawazbûna sîyasetên aborî yên ku li ser herêmê hatine sepandin, û hîlbijartîya wan ji bo hesabên sîyasî, yan jî ji ber sedemên din ên ku girêdayî xwezaya sîstema sîyasî bûn, û mekanîzmayên bikaranîna çavkanîyên aborî yên li welat.

Li vir em dikarin hin taybetmendîyên aborîya herêmê rêz bikin, ku ev taybetmendî bi awayekî yekser û ne yekser bandorekê li çawanîya geşepêdana herêmê û bîchanîna sîyaset û rêkarên wê dike. Ji wan taybetmendîyan ev in:

1- Serwerîya sektora bazirganîyê weke çavkanîyeke aborî ya sereke

Bazirganî damara sereke ya aborîya Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, lewra dahateke baş ji ber tê ku ew jî bi rêya bacên ku li ser kelûpelên hinartî tên ferzkirin û fêdeya ku ji ber sazîyên Rêveberîya Xweser tên, her wekî yên bazirganîyê (hawirdekirin an jî kirîn û firotina li bazarê). Di vê çarçoveyê de, bazirganîya trimbêl û kelûpelên xwarinê ji madeyên herî zêde ne yên ku bo herêmê tên hinartin, li rex wan jî madeyên avanîyê, alavên male yên li ser kehrebeyê û yên elektronîk.

Îcarê bi vê yekê, ti giringî ji bo sektorên hilberînê di nava pergala aborî ya Rêveberîya Xweser nayê dayîn, her wekî sektora bazirganîyê û ya pîşesazîyê, ku piştî herêm ji bin kontrola hikûmeta sûrî derket, derbasî rewşeke nû bû, îcarê rêkar û mekanîzmeyên sazîyên û ji bilî wan hatin hêsankirin, lê bi pirranî giranî bo pîşeyên xwarinê û serfikirinê hat dayîn, evê yekê destekdayîn neda binasazîya hilberînê û bingehên geşepêdanê li herêmê û tenê di destên sermayedarên bazirganîyê yên bi lez fêdê dibînin, her wiha hişt ku asta enflasyonê bilindtir bibe.

Tevî ku sektora çandinîyê xwedî girnîgîyeke awarte ye, ji ber rûberên çandinîyê yên berfireh û pirranîya xelkên herêmê xwe dispêrin dahata ji ber tê, lê ev sector heta niha jî xwe disperse ava baranê û cihê xwe di nava projeyên weberhênanê yên mezin de nagire, di encamê de rêjeya hilberînê dadikeve û berhemdarî lawaz dibe, her wiha ti projeyên ji bo geşkirin an bipêşxistina vî sektorî jî nayên dîtin, berevajî wê, roj bi roj zehmetîyên berhemdarîyê weke bilindûbûna lêçûnê, kêmbûna pêdivîyên bingehîn û hejmara karkerên çandinîyê, ji ber gelek sedeman derdikevin holê.

2- Kêmbûna weberhênan û kêmpedyabûna sermayedaran

Weberhênan û zêdekirina projeyên wê yek ji bingehên bicihanîna geşepêdana aborî ye, ew jî bi rêya başkirina Nîşaneyên Makroekonomîk weke zêdekirina qebareya hilberîna xwecihî û hêsankirina xwestekên ji bo karker û karmendîyê, her wiha bilindkirina nirxê serêdekirê û di encamê de dê asta dahata kesan û civakê bi awayekî giştî baştir bibe.

Ji ber şert û mercên aborî yên li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê û pêwîstîya wan bi baştirkirina binasazîyê û cîbicîkirina pirojeyên weberhênanê li ser çend astan, çî pêkhatî û çî sektorî; Bê guman, meyla

weberhênanê herî kê m e. Sedem ji alîyekî ve girêdayî çanda civakê ye û ji alîyê din ve bi meylên aborî yê sazîyên Rêveberîya Xweser ve girêdayî ye her wiha û bi rewşa sîyasî û bernameyên wê yê bi ser rêveberîya xweser ve ku gelo çiqasî meseleya zêdekirina mîqdar û cureyê weberhênanê ji nebûna wê girîngitr e ve girêdayî ye.

Bi awayên xwe yê madî û darayî, aborîya herêmên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê êşa kêmbûna sermayedaran dikêşe, çimkî ev sermayedar weke faktoreke binge hîn a saz kirina projeyên weberhênanê tê dîtin û ev yek bi gelek hêmanan ve girîdayî ye, yê herî girîng jî hêmanê sîyasî ye, her wekî ne-aramîya sîyasî li herêmê û hêmanê aborî jî ku di milê hilanîna darayî de pirr kê m e ji ber dahata kesan a lawaz û tenê dabînkirina pêwîstîyên jîyanî yê sereke, di wextekî de ku enflasyon bilind dibe û buhayê tiştan li bazaran zêde dibe, îcarê di encamê de derfeta hilanîna darayî li cem kesan tune dibe.

Ji alîyê Rêveberîya Xweser ve, ew jî êşa çavkanîyên darayî û zêdebûna perpirsyarîyên civakî, aborî û leşkerî dikêşe, ev yek dihêle ku derfeta peydabûna sermayedaran pirr kê m be ji alîyekî ve, û ji alîyekî din ve berxwevekêşana sermayedaran û bikaranîna wan di weberhênan de pêwîstîya xwe bi hêmanên weberhênanê heye, çî yê îdarî yê birêxistinkirinê bin weke qanûnê weberhênanê û bichkirin û saz kirina projeyên weberhênanê an jî hêmanên sîyasî yê girêdayî rewşa aram a ewlekarîyê ku weke mercekî derbasbûna sermayedaran bi sektorên weberhênanê tî dîtin, lê heta niha jî ev peyda nabin.

3- Hejmara kê m a pispor û şarazayên xwedî astên zanistî û têkçûyîna sîstema xwendinê

Di serî de yê birêveber, li herêmên Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pispor û şaraza gelekî kê m in, ew jî ji ber pêlên koçberîyê yê di salên şer de ji herêmê derketin, îcarê hin sîyaste û rêbazên destnîşankirê di milê aborî de hatin bikaranîn, ku ne li gorî nêrîn û arasteyên gelek kesên pispor û şaraza bûn.

Sîstema perwerdehîyê ya ku ji alîyê Rêveberîya Xweser ve hatiye avakirin -heta niha- nekarîye sazîyên xwe yê îdarî û aborî bi şarazayên zanistî ku bikarin pêşengîya proseya geşepêdana aborî û civakî li herêmê bikin ava bike. Heta bi zanîngehên girêdayî Rêveberîya Xweser jî, ku niha li herêmê ne, ti Fakulteyên wê yê pispor di warê aborî û birêvebirîyê de nînin, û

tenê bi hebûna peymangehek darayî ya piratîk ve sînordar e, ku heyama xwendinê du sal e, ji bo hînkirina bingehên hesabên darayî û birêveberî.

4- Lawazîya astên berhemdarîya kar

Li herêmê ti zêdebûneke aborî (Surplus) a rasteqîn tune ye, ew jî li lawazîya geşbûna aborî, nebûna projeyên weberhênanê di sektorên hilberînê de vedigere, her wiha li rex wê jî, piranîya karkerên li herêmê di sektorên îdarî û xizmetguzarîyê de di nava sazîyên Rêveberîya Xweser de dixebitin, ev sazîyên ku bi hebûna bêkarîyê tînan nasîn û bi xwe re, daketina berhemdarîya kar û wendakirina rêjeyê baş a enerjî û çavkanîyên li ber dest tîne.

Li rex wê yekê jî, rê û rêbazên hilberînê û alavên wê di sektora taybet de ne pêşketî ne û çanda fêdeya bilez her li pêş e, her wiha asta pisporîya karkeran û jêhatîya wan a hilberînê kêmtir e û makîne û alavên pêşketî di proseya hilberînê de bi awayekî giştî nayên bikaranîn, dibe ku ji ber buhabûna lêçûnên wan be û dibe ku hinartina wan bo herêmê û anîna wan zehmet be, îcarê ev hemû dihêlin ku astên berhemdarîya kar li kêmtir bikeve û astên fêde lawaz bin û karîna berfirehkirina hilberînê û bipêşxistina wê ji nav biçê.

5- Nebûna bingehên plansazîya zanistî

Em dikarin bibêjin ku ti formeke aborî ya destnîşankirî ji aborîya heyî ya herêmê Rêveberîya Xweser re tune ye, çimkî li cem Rêveberîya Xweser avanîyeke aborî ya rasteqîn ku em dikarin navê pergala aborî ya hevgirtî lê bikin tune ye, inçex em karibin bibêjin ku sazîyên îdarî yê aborî yê bi ser Rêveberîyê ve, tenê sazîne ku rewşa heyî ya aborî bi rê ve dibin in, bi formên cuda yê li gorî rewşa sîyasî ya bi awayekî giştî herêmê re derbas dibe.

Tê zanîn ku Rêveberîya Xweser xwe sîparte felsefeya aborîya civakî weke bingeha pêkanîna geşepêdana aborî û civakî li herêmê jêr desthilatîya xwe û di çarçoveya ne-navendîyê de, lê tiştê li ser erdê çêbûnê cuda bû, çimkî ev cureyê teorîya aborî û bîchanîna wê pêwîstîya xwe bi hêman û bingehên teorîk û civakî heye û ev yek li herêmê peyda nabe, tevî hebûna hêmanên aborî weke çavkanî û bînesazîya aborî, û li vir bi awayekî bilez Rêveberîya Xweser berê xwe ji bîchîkirina bingehên vî awayê aborîyê ber bi destserîya sermayedaran û bazirganên mezin li ser bazar û mekanîzmeya wê vî guherî û di çarçoveya birêvebirina rewşa heyî de sînordar ma.

Di dema nebûna sîstema aborî ya hevgirtî, tevî ku ofîseke plangerî û geşepêdanê di avaniya îdarî ya sazîyên Rêveberîya Xweser de heye jî, lê dîyar e ku planên aborî yên siberojê di nava xebatên rêveberîyên aborî de tune ne, nîşaneya vê yekî jî ew e ku budceyên weberhênanê yên di budeceya giştî ya Rêveberîya Xweser a sala 2021-2022 nayê zelalkirin², ev yek ji aliyekî ve bi rewşa sîyasî ya ne aram ve girêdayî ye, û ji aliyekî din ve bi helwesta Rêveberîya Xweser a di derbarê sektorê aborî û geşepêdanê de.

Li rex vê yekê em dikarin behsa nebûna çavkanîyên mirovî yên jêhatî jî bikin ku dikarin li şûna sazîyên Rêveberîya Xweser yên ku xebatên xwe li gorî lihevkerîyên sîyasî û para partîyên li jêr sîwana wê, sîyasteya aborî ya herêmê deynin. Her wiha em dikarin balê bikişînin ser nebûna plansazîyan ku sazîyên Rêveberîya Xweser ti nîşaneyên girêdayî aborîyê bi giştî belav nake, ev nîşaneyên ku mirov dikare di danîna planên aborî de xwe bispêre wan, rêyên birêvebirina wan û mekanîzmeyên bichanîna wan destnîşan bike.

Du- Sedem û pêwîstîyên herî girîng ên geşepêdana xwecihî

Sazîyên aborî yên li herêmên Rêveberîya Xweser bi taybet ên girêdayî aborîyê, dikarin lêkolîn û vekolînên zanistî yên di derbarê rewşa aborî de, rêyên geşepêdanê yên liberdest encam bidin, û dikarin derfet û îmkanên liberdest ji bo qezenckirina di çarçoveya planên geşepêdanê de zelal bikin, her wiha zehmetî û astengîyên ku rê li ber proseya geşepêdanê digirin, destnîşan bikin.

Helbet ji gavên herî girîng jî derxistina bilez a qanûna weberhênanê ye, ku bi rêya wê rê li ber weberhênanên çalak û nerm tê vekirin, û bi armanca berfirehkirina bingeha berhemdarîyê, bi taybet ên projeyên piçûk û navîn, ew qanûn dikare rêkarên sazîyên û danîyên weberhênan hêsan bike. Ev yek dê derfetên kar bi xwe re bîne û di encamê de dê hilberîna xwecihî zêdetir bibe, para kes a dahatê bilindtir bike û dê nirxê zêdekirî yê pêwîst ji bo berfirehkirina hilberîn û weberhênanê peyda bike.

Li vir em dikarin çend sedem an jî pêwîstîyên demkî yên ji bo pêkanîna pêvajoya geşepêdana xwecihî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê rêz bikin:

1- Astengîyên niştimanî û sîyasî li pêşîya Rêveberîya Xweser

² Li gorî budceya pêşbînîkirî ya sala 2022`an, qebareya xerciya weberhênanî tenê 80 milyon dolar bû, ev yek li gorî budceya giştî ya ku 981 milyon dolar bû ne tiştê e.

Li ser asta dewleta sûrî, tecrûbeya Rêveberîya Xweser a sîyasî, tecrûbeyeke nû û ya yekem e, îcarê ji gelek alîyên herêmî û xwecihî rastî fişaran tê û bandorê li rêya wê ya sîyasî û aborî pev re dike. Lewra pêwîst berpîrsên vê Rêveberîyê projeya xwe îsbat bikin di wextekî de ku rastî gelek astengî û berdewamiya aloziya Sûrîyayê tê, da ku pêdivîyên xelkê herêm dabîn bikin û rewşa jîyanî û xizmetguzarî baş bikin.

Li vir, pêwîst e lêkolîn li ser derfet û rêyên destpêkirina pêvajoya geşepêdana xwecihî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê û bi spartina şîyan, gencîne û çavkanîyên aborî û mirovî yên herêmê û bikaranîna wan di xizmeta başkirina jîyan û xizmetguzarîyê, û pêşxistina bingeha aborî, ku dibe sedema serkeftina ezmûnê, li ser asta niştimanî ya Sûrîyayê, ev yek îsbat dike ku Rêveberîya Xweser kare zehmetîyên ku derdora wê dorpêç dikin derbas bike, û dikare asta aborîya herêmê bi pêş bixe, û kare pêdawîstîyên navçeyên xwe dabîn bike, tevî dijwarî û kêşeyên dijwar ku rûbirûyê wê dibin.

2- Rageşîyên ewlehîyê û nakokîyên sîyasî yên dem bi dem

Ev yek dihêle ku herêmên Rêveberîya Xweser û rewşa wê ya aborî girêdayî rewşa sîyasî û sîyasteyên dorpêçîyê yên li dijî wê bi rê ve diçin bibin, nemaze dema hin rageşî yan rûbirûyên leşkerî çêdibin, di encamê de bandor li proseya dabînkirina kelûpel û berhemên pêwîst li bazarê dibe, berhem kêr dibin û rewşeke nearam çî di milê qasa madeyan de be, çî jî di milê nîrxê kelûpelan de be derdikeve holê û karînen mirov ên bidestxistina pêdivîyên xwe ji kelûpelan û madeyên rojane yên jîyan berûpaş vedigere.

Li vir, girîng e planên geşepêdanê yên li ser asasê encamdana weberhênanan bîncîkirin û guhdan bi projeyên piçûk û navîn û bi taybet ên girêdayî hilberîna kelûpel û berhemên ji herêmê re di sektora çandî û taybet sektora pîşesazî de pêwîst bê dayîn, ew jî bi armanca peydakirina pldivîyan mirovan û da ku berhemên wan projeyan şûna yên hawirdekirî bigirin.

3- Desteserîya Rêveberîya Xweser li ser tevaya saman û şîyanên herêmê, di nav de petrol jî

Ev samanên em behsa wan dikin bi qasî 55% ji samanên dewleta sûrî ne, îcarê di ber bingehen geşepêdana domdar, gerek e Rêveberîya Xweser van saman bi awayekî herî huncaw qezenc bike, çimkî dikarin zêdegavîyên

aborî bi xwe re bînin û ji bo cîbicîkirina bername û projeyên geşepêdana aborî li herêmê bîn bikaranîn.

Tevî bargiranîya darayî ya li ser milê Rêveberîya Xweser, lê eger rê û rêbazên zanistî di warê danîn û bicihkirina planên aborî bîn bikaranîn, her wiha mekanîzmeyên guncaw ên qezenckirina çavkanîyên liberdest bîn meşandin û di ber projeyên weberhênanê yên berhemdar de bîn terxankirin û bi awayê xwestî li sektorên aborî bîn belavkirin wê zemînekê ji bilindkirina rêjeyên geşbûnê re bê avakirin û bi rengêkî saxlem dê prosesa geşepêdana aborî bi rê bikeve.

4- Avakirina bingeheke aborî û berhemdarîyê li herêmê

Ji rêgezên herî bingehîn ên aramî û biserxwebûna biryara sîyasî li herêmê, avakirina bingeheke berhemdarîyê yak u dikare hilberîna xwecihî zêde û cihêreng bike ye, her wiha dikare rêjeya geşbûnê zêdetir bike, derfetên kar peyda bike, kelûpel û pêdivîyên bingehîn li bazarê peyda bike û pêdivîyên xelkê bi cih bîne, ev yek dê bihêle ku rengêkî ji aramîyê li bazarê encam bide, lêçûnên hawirdekirinê kêmtir bike, ku ew jî dê kêmbûna nirxan bi xwe re bîne.

Li alîyekî din, dikarin projeyan di hundirê sektorên berhemdarîyê de bîn saz kirin û li gorî planên geşepêdanê û bi awayekî hevseng bin, ev yek dê bihêle ku zincîrek piştgirîya danûstandinê ya peydakirina madeyên pêwîst ji hilberîn an xerckirina berheman derkeve holê, her wiha dê bihêle ku pereyên bîyanî yên ji bo hawirdekirina pêdivîyên prosesên berhemdarîyê û kêmkirina lêçûna wan were bidestxistin û di encamê de wê li bazaran kelûpelên xwecihî bi nirxekî arzan peyda bibin.

5- Başkirina asta aborîya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Bêguman, bi peydabûna çavkanîyên xwestî, eger prosesa geşepêdana aborî li herêmê bi awayekî rast û baş bi rê ve biçê ew dê karibe asta aborîya herêmê baştir bike, ew jî bi rêya piştgirîya geşepêdana sektorî ya hevseng û bipêşxistina sektorên aborî yên sereke her wekî sektora pîşeyî ku madeyên pêwîst yên modern û madeyên xam û teknîk û teknolojîyaya pêşketî li gorî derfetên heyî pêşkêşî wê bikin, her wiha ji bo sektora çandinî jî, dikare rûberên çandinîyê yên berfireh û axa herêmê ya nangir qezenc bikin û şewazên hilberîna çandinîyê yên pêşketî wekî avdana pêşketî, danîna kanalên avê bi kar bînin. Li alîyê din, bipêşxistin û geşepêdana binesazîya herêmê û başkirina rewşa xizmetguzarîyên sereke

weke torên kehrebeyê, rê, avakirina piran û bicihanîna torên avê û lolkêşan. Ev hemû di çarçoveya plansazîyên geşepêdanî yên li ser bingeheke zanistî û li gorî rewşa aborî ya herêmê tên kirin, îcarê di encamê de, armancên xwestî dê pêk werin, weke mayîndekirina rewşa aramîya herêmê, bilindkirina asata geşbûn û başkirina astên dahatan. Bi vê yekê dê rengê ji rengê rewşa aborî ya rehet dê li herêmê pêk were.

6-Çareserkirina rewşa gendelîya birêveberî

Danîna planên geşepêdanê yên bêkêmasî û pevgirêdana sektorên aborî yên sereke li ser bingeheke bihêz û rast, her wiha danîna yasayên pêwîst dê xebatên weberhênanê birêxistin bike, berê sermayedarn ber bi herêmê ve bîne û ji bo xebatên weberhênanê bîst terxandin, bi vê yekê dê nirxên zêde encam bidin û ew sektor bi toreke têkilîyên aborî yên hevtemam bi hev ve bîst girêdan, îcarê bi armanca bipêşxistin û başkirina asta xebatên aborî dê ji hevûdin re bibin palpişt.

Bi vê plansazîya aborî û danîna zagon û qanûnên birêxistinî dê rewşeka ji karîna nirxandin û bicihanîna projeyên geşepêdanê û çavdêrîkirina wan derxe holê, pê re jî, dê rewşa gendelîya îdarî bê kontrolkirin ku bandorekê li aramîya aborî û îdarî dike û tenê di ber berjewendîyên takekesî de ye û bandoreke neyînî li nîşaneyên geşepêdanê yên aborî dike û helwesteke neyînî ya civakî di derbarê rewşa îdarî û qanûnî li nav sazîyên Rêveberîya Xweser û berpîrsên wê diafirîne.

Beşê Sêyem- Stratejîyên geşepêdanê yên pêşinyarkirî

Helbet geşepêdana aborî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bûye pêdivîyeke girîng, nemaze di wextekî de ku aborîya herêmê berûpaş vedigere, ew jî ji ber bandorên sîyasî yên alozîya sûrî ji alîyekî ve, û ji alîyekî din ve nearamîya girêdayî gefên Tirkîyayê yên li dijî herêmê. Her wiha ji milê aborî ve jî, nebûna palanên aborî yên geşepêdanê yên zelal û hevgirtî, ku sazîyên aborî yên eleqedar karibin li gorî wan bimeşin û prosesa geşepêdanê bîst ser rêya rast, evê yekê hiştîye ku xerckirineke zêde di milê çavkanîyên liberdest ên li herêmê de rû bide û bi awayekî xwestî, fêde ji wan neyê dîtin.

Yek- Geşepêdana sektori

Bê guman, sektorên hilberîne yên sereke û geşepêdana wan, hêmaneke bingehîn a geşepêdanê ne, çî li ser asta herêmî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi awayekî taybet, û çî jî li gorî towrîya aborî bi awayekî giştî.

Sektora çandinîyê li herêmê xwedî girîngîyeke awarte ye, ji ber hebûna qadên çandinîyê yên berfireh, serdestîya dahatên çandinîyê di nav xelkê de, û berhemên çandinîyê yên stratejîk ên ku têne hilberandin, di heman demê de, gerek e girîngî bi sektora pêşesazîyê jî bê dayîn û pîlan û sîyasetên geşepêdanê û bipêşxistina wê werin cîbicîkirin, çimkî dikare nirxên zêde û derfetên kar peyda bike û her wiha pêdivîyêên prosesên hilberîne û yên ne hilberîne ji xwe re û ji sektorên din re hilberîne.

Geşepêdana aborî weke prosesê gişgir tê nasîn û tenê bi sektorekê ve ne sînordar e, lewra pîr girîng e ku planên geşepêdanê sektorên din jî di nava xwe de vehewîne, çî yên girêdayî binesazîyê bin an bazirganîyê û xizmetguzarîyê bin çî jî yên darayî û bankî bin, ew jî bi armanca afirandina rengê ji rengên hevtemamkirina aborî û pir-sektori û rêgirtina li ber serdestîya sektorekê li aborîya herêmî yan jî tenê xwesipartina li ser sektoreke bi tenê ji bo peydakirina tevaya dahatên pêwîst ji herêmê re.

1- Geşepêdana Çandinîyê

Sektora çandinîyê yek ji stûnên herî bingehîn ên prosesa geşepêdana aborî û civakî yên pêşhatî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ye; ji ber ku weke Abraham Lincoln jî dibêje: ew "Sektora Gel e". her wiha çavkanîya sereke ya xwarinê ye û gelek derfetên kar jî peyda dike, li alîyekî din jî madeyên xav û gelek madeyên pêwîst ji bo pîşesazîyê li herêmê peyda dike. Lê alîyê wê ya herî girîng ew ku berhemên stratejîk weke pembo, genim û şînkayî ji herêmê re dabîn dike, ev yek helbet roleke xwe di başkirina rewşa ewlehîya xwarinê li herêmê de heye.

Ji ber vê yekê, geşepêdana sektora çandinîyê yek ji girîngtirîn pêşanî ye ku divê di qonaxa bê de li serê were sekinandin, ji ber ku peydakirina berhemên çandinîyê yên pêwîst li herêmê dê hewcedarîyên bingehîn ên xwarinê ji malbatên herêmê re peyda bike, nemaze ku ev bazar di dabînkirina berhemên çandinîyê yên xwecihî de kêmasîyên xwe heye, ji ber vê yekê jî piştî xwe bi hinardekirinê asê dike, an jî ji hundirê Sûrîyayê tê dabînkirin.

Lewra, geşepêdana sektora çandinîyê yek ji rêyên herî guncaw ên başkirina rewşa ewlehîya xwarinê ye û dikare bandorê li tevaya alîyên geşepêdana aborî yan civakî yan jî ekolojî bike. Ji ber vê yekê gerek e girîngî bi vê sektorê bê dayîn û di demeke herî bilez de were cîbicîanîn, ew jî bi hêvîya ku ev prose pêdivîyên bingehîn û sereke li gorî karînen kirinê yê xerckirinê dabîn bike, di wextekî de ku -roj bi roj- lêçûn û buhayê hilberînê bilindtir dibe.

A- Zehemîyên li pêşîya geşepêdana sektora çandinîyê

Sektora çandinîyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê rûbirûyê gelek kêşeyan e, ku hinek ji wan bi encamên krîza Sûrîyayê ve girêdayî ne û hinek jî girêdayî rewşa aborî û berhemanîna wê sektorê bi xwe ne.

Di asta yekem de, krîz bû sedema zêdebûna zehmetîyên berhemanîn û kîrrûbirrê di sektora çandinîyê de, ji ber bihabûna nirxê kelûpelên berhemanînê û bihayê enerjîyê, bi nebûna tovan, û windabûna gubre, ajelan, û dermanên çandinîyê, ji bilî qutkirina rêyên veguhestinê, û koçkirina gelek karkerên çandinîyê, yan xwedîyên zevîyan, çî ber bi bajaran û çî li derve. Ev hemû bûn sedema kêmbûna rêjeya berhemê di vê sektorê de, û bû sedema kêmbûna bazarên berhemên çandinîyê, ku nirxê wan bilind kir, û bû sedema kêmbûna şîyana malbatan ji bo dabînkirina pêdivîyên xwarinê yê rojane.

Di asta duyem de, çandinîya bi baranê li herêmê serdest e, ji ber ku ava baranê ji bo avdana zevîyan, nemaze rûberên berfireh ên genim û ceh, dibe sedema kêmbûna berhemdarîya zevîyan, û ji ber vê yekê di mîqdarên hilberanê de, û di zêdebûna lêçûnên wan de tê xuyakirin. Her wiha herêm bê projeyên çandinîyê yê nûjen û mezin in, ku bi astên bilind ên performansê aborî û lêçûnên kêmtêne dîyarkirin, ji ber aborîya pîvanê ku ji hêla projeyên wiha ve têne peyda kirin.

Girîngtirîn kêşeya ku rûbirûyî sektora çandinîyê ye û her pêvajoyeke geşepêdanê di wê de, pîrsa hebûna avê ye, nemaze ku li herêmê di van salên dawîn de baran kêmtar bûya, rê li ber rêjeyeke mezin a avê hate girtin ew jî ji ber ku ev av ji alîyê Tirkîyayê ve diherikî û wê kontrol dikir, îcarê dibe sedema kêmbûna şîyana avdanê li wan erdan, ku girêdayî pirojeyên cuda yê avdanê ne. Her wiha çanda avdana kevneşopî li gorî rêbazên nûjen ên avdanê serdest e, ku ev jî dibe sedema xerckirin û windakirina rêjeyên mezin ên avê, û bandorên jîngehê li ser projeyên geşepêdana domdar dihêle.

B- Girîngîya projeyên geşepêdana çandinîyê

Çandinî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê stûna bingehîn a her proseyeke geşepêdanê ye ew jî ji ber hebûna rûberên çandinîyê yê berfireh û biber ku dikare ewlehîya xwarinî pêdivîyên prosesa berhemdarîyê misoger bike, her wiha nirxên zêde ku cihê sûdê ne ji bo başkirina rewşa hilberînê û karê aborî li sektora çandinîyê bi xwe re tine. Ji ber vê yekê, pêdivî heye ku planên geşepêdana çandinîyê yê ku bikarin sîyaset û rêkarên bipêşxistina sektora çandinîyê misoger bikin, bi cih bînin, ew jî bi rîya danîna projeyên hilberînê yê nûjen ên xwedî rêgezên nûjen ên di çandinî, avdanî û xwedîkirina heywanan de, bi giranî bixin pêş. Li ser pêwîstîya piştgirîkirina pirojeyên nûjen ên avdanê, wek toreyên avdana dilopan, an avdanîyê, bi rêya sprinkleran, ji bilî projeyên kanalên avdanê, sûdwegirtina ji ava bendavan, berfirehkirina deverên avdanî û zêdekirina rêjeya wan bi tevahîya zevîyên çandinîyê re, û avakirina kargeh û projeyên pêwîst ji bo dabînkirina kelûpelên ji bo proseya çandinîyê, wek kargehên çêrekirina heywanan, û çêkirina zibilên kîmyayî û dermanên çandinîyê yê pêwîst ji bo rijandina berheman û zêdekirina berhemdarîya wan. û baştirkirina kalîteya tovên sebzeyan, ji bo zêdekirina berhemdarîya wan di kalît û hejmarê de.

2- Geşepêdana sektora pîşeyî

Piştgirîya bi sektora pîşesazî re yek ji stûnên herî girîng ên pêvajoya pêşkeftina aborî ye. Li gorî vê yekê, divê distpêkê girîngî ji bo avakirina bingehêk pîşesazî ya cihêreng bê dayîn, ku bikaribe hewcedarîyên bazarên bi kelûpelên bingehîn ve dabîn bike, û yê ku di prosesa hilberandinê de ne, pê re dê rêjeyên mezinbûna aborîyê bilind bibin û beşên mayî yê di hundirê aborîyê de aktîv bibin. Ew jî bi rêya navgînîya pêwendîya pêş û paş ve, ku ji hêla pêvajoyên cûda yê hilberînê ve, çî di nav heman sektorê de, an jî bi sektorên din re têne hilberandin.

Li vir û li gorî rewşa aborîya herêmê û asta peydabûna hêmanên sereke yê hilberînê, em dikarin girîngîyê bidin projeyên piçûk û navîn û peydakirina jêzemînekê ji weberhênanên pêwîst re, da ku hanedan ji weberhêneran re çêbibe û yê heyîn jî bînin bipêşxistin û berfirehkirin, çimkî ev proje dikarin binesazîya hilberînê rengereng bikin û pêdivîyên bazarê yan jî yê hilberînê, her wiha hawirdeyên sereke yê gelek prosesên hilberînê yan jî madeyên navîn û alîkar dabîn bikin.

Ji wê yekê zêdetir, dê ti pêwîstî bi sermîyanên mezin tune be, û dê derfetên kar zêde bibin û di encamê de dê qebareya dahatan zêde bibe, bazar çalak bibin û rêjeya geşbûnê bilind bibe.

Bê guman, bipêşxistina sektora pîşesazî û destnîşankirina weberhênanên alternatîve di vî sektorî de li gorî rewşa aborî ya heyîn û derfetên li ber dest, bi taybet geşkirina pîşeyên veguheztinê dê zemîneke gunvaw a bineszaya hilberînê li herêmê bi xwe re bîne û kualîteya hilbernê baştir bike. Ji xwe ev mesele gerek e cihê pûtepêdanê be ji bo alîyên xwedî biryar û yên ku sîyast û plansaziyên pêwîst dideyinên. Her wiha gerek e ev pûtepêdan di ber bipêşxistina vî sektorî û başkirina rewşa weberhênanan de be.

3- Sektora bazirganî û xizmetguzarî

Sektora bazirganîyê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê li gorî sektorên din yên aborîya xwecihî çalak bû, ew jî ji ber faktorên di encama aloziya Sûrîyayê û karvedanên wê li ser herêmê de, her wiha ji ber makanîzme û sîyasteyên aborî yên ku Rêveberîya Xweser bi kar tanîn. Rêveberîyê didît ku bacên cumrikê yên ku li ser hawirdeyan tên sepandin, çî li ser yên ji herêma Kurdistanê tên yan jî li ser yên ji hundirê Sûrîyayê, weke çavkanîyeke darayî ya ji bo dahatên xwe ambar bike ye. Her wiha wê (Rêveberîya Xweser) sîyastine destnîşankirî di prosesa hawirdekirinê de û radestkirina wan bo kesine destnîşankirî bi kar anî, ev kes an biznizmanên naskirî li herêmê ne yan jî kesine xwedî têkilîyên xurt bi Rêveberîya Xweser re ne. armanca ji wê yekê ew bo ku prosesa hawirdekirinê li gorî nêrîna aborî û sîyasî ya Rêveberîyê ji alîyekî ve, û ji alîyekî din ve dabînkirina hawirdeyên darayî yên prosesa bazirganî bi awayekî birêxistinkirî û şewene ku xwedîyê wan nikaribin xwe ji ber fikkirina bac û xercan (risûmat) ji Rêveberîya Xweser bidin alî, bê kontrolkirin.

Ji ber wê, û tevî ku sazîyên Rêveberîya Xweser rê da kesan ku prosesên bazirganî û hawirdekirinê pêk bînin, piştî xwe mercên qanûnî û birêveberî bi cih bînin, lê dîsa jî xwedîyên têkilîyên bi Rêveberîyê yan jî bi alîyên derveyî ve, danûstandineke baş û alîyê Rêveberîya Xweser ve bi dest xistin, îcarê di encamê de rikberîyeke newekhev di navbera wan kesan û bazirganên normal de encam da.

A- Astengîyên li pêşîya sektora bazirganîyê

Wekî me li jor gotî, sektora bazirganîyê xwedî çalakîyeke aborî ya cîhanî bû li gorî rewşa sektorên din, lê ev yek ji bo rûbirûbûna astengîyên li pêşîya vî sektorî têrê nedikirin.

Ji alîyê rewşa hundirîn ve, meseleya pûtepedana bi projeyên bazirganîyê yên girêdayî hin xizmetguzarîyên destnîşankirî weke bazirganîya otombîlan, ofis û kompanyayên veguheztin û pevguherîna pereyan û hawirdekirina madeyên xwarinê, ev hemû dibin astengî li pêşîya sektora bazirganîyê, çimkî sermîyanan dike çarçoveyeke teng de û alî û çînan di nava civakê de derdixe.

Her wiha meseleya xwespartina Rêveberîya Xweser li hin kesayetên destnîşankirî ji nava biznizmanan ji bo xebatên bazirganîyê bi taybet hawirdekirina kelûpelan bo herêmê jî, yek ji astengîyên di sektora bazirganîyê de ye, çimkî ev mesele xwedî bandorên aborî û civakî yên cihêreng e û rê li ber rewşên zengîl û dewlemendîyê yên ne ji rêzê li herêmê vekir.

Ji alîyê îdarî û rêxistinî ve jî gelek kêşe li pêşîya vê sektorê derdikevin, wek sert û mercên birêxistinî û damezrandina şîrketên bazirganî, yan karên ku destûr didin wan, yan jî mekanîzmayên karê wan. Ji bilî mijarên girêdayî çanda qezenckirina bilez, heta li ser hesabê enflasyonê, û bilindkirina bihayên li bazaran.

Ji alîyê din ve, bazirgan xwe bi ti exlaqên kar ve girêdayî nabînin, ku bi gelemperî ji hêla karsaz û xwedîyên aktorên aborî yên civakên wan ve têne kirin, mîna piştgirîya projeyên xêrxwazîyê, piştgirîya bazaran, zêdekirina peydakirina bi bihayên guncaw di dema qeyranên aborî de. an jî zêdekirina xizanîyê, û mijarên din ên bi exlaqên aborî ve girêdayî ne. Ev yek ji bo belavkirina çandê cihêreng a lêgerîna qazancên bilez, û bidestxistina zêdetir ji wan, di dema herî kin de astengîyeke eşkere ye.

Em li vir ji bîr nekin ku meseleya belavbûna vîrûsa Coronayê jî astengîyeke girîng di mijarên belavkirin û xerckirinê de, yan jî di milê beydakirina madeyan ji çavkanîyên wan, çimkî dema qedexeyeke giştî li herêmê tê sepanin, rewş xerabtir dibe û ev sektor mîna ku felc bibe û bandor li rêjeyên xebatên wê tê kirin û bi awayekî giştî li tevgera bazarê.

Hêjayî gotinê ye ku bazirgan piranîya mekanîzma û qonaxên zincîreyên dabînkirina bazaran kontrol dikin, û ev yek dijwarîyek nû ye ku hewcedarî bi qanûnîkirin û birêkûpêkkirina vê proseyê ferz dike, bi awayekî ku garantîkirina parastina mafên hilberîner û xerîdar, û rê dide herikîna

kelûpel û berheman ji navendên wan ên hilberînê ber bi navendên wan ên xerckirinê re bi hêsanî û bi rêkûpêk, bêyî ku rê bidin yekdestdarîyê, an jî ferzkirina rêjeyên qezencên bilind ji hêla bazirganan ve li ser wan.

B- Geşepêdana sektora bazirganî û xizmetguzarî

Ji ber girîngîya taybet a ku Rêveberîya Xweser daye sektora bazirganîyê, em dikarin bibêjin ku ji bo geşkirina evê sektora jîyanî û girîng û bipêşxistina wî, divê bi awayekî bilez qanûnên girêdayî bazirganî û birêxistinkirina xebatên bazirganîyê bîn cîbicîkirin, da ku bi rola xwe ya aborî di warê geşepêdanê de rabin, her wekî zêdekirina dahatên aborîya xwecihî, peydakirina derfetên kar, dabînkirina bazarê ji kelûpelên pêwîst û berheman û destekdayîna çalakî û tevgera bazarê bi armanca hevtemamkirina xala berhemanîn û daxistina li bazarê, da ku berhmder bi hêsanî bi prosesa jinûve-berhemanîn û başkirin û bipêşxistina wê rabin, bi vê yekî dê pêdivîyên yekîneyên aborî çî sazî û jî kes, bi buhayên guncaw bîn peydakirin.

Her wiha ji bo pêşxistina vê sektorê xebat pêwîst e, di asta bazirganîya navxweyî de yan jî di asta bazirganîya derve de kadroyên jêhatî bîn peydakirin û tenê bi karkerên ku biryarên îdarî bi cih tînin têr nebin. Ev ji ber ku ev sektor girîngîya herî mezin hildigire, û ew di nav tevgerên aborî de bi tevgerê bilind re têkildar e. Ji ber vê yekê, pêwîst e ku xebatkarên xwe nûve bike û rahînanan bidomîne, li gorî hewcedarîyên başkirin û pêşveçûna berdewam.

Ji alîyekî din ve, bê guman dayîna rêdanên bazirganî û rêdana ji bo xebatên bazirganîyê divê li gorî rêgezên îdarî, qanûnî û aborî yên destnîşankirî bin, ku bihêlin ev sektor di prosesa geşepêdana aborî û civakî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bêhtir çalak bin.

Li nik wê, gerek e torên rêyan û veguheztinên xwecihî bîn başkriin da ku barhilgir û kemîyonên taybet bi hêsanî kelûpelan veguhêzin, û lêçûn kêmtir bibe û bi awayekî billez bîn veguheztin, bi vê yekê dê pêdivî û kelûpelên pêwîst li herêmê li dever û di wextê guncaw de bîn dabînkirin, di asteke ku bi navê lêçûna aborî ya hevseng tînin nasîn bi rê ve biçe.

Du- Qonax û gavên plansaziya stratejîya geşepêdanê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

Pêvajoya geşepêdanê xwe dispêre stûnên bingehîn, her wekî stûna aborî, civakî û ya ekolojî. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku pêvajoya

geşepêdana aborî, li gorî stratejîyeke destnîşankirî û gavavêtinine guncaw, parçeyek ji pêvajoyeke berfireh û gişgir e, ew jî pêvajoya geşepêdana total û domdar e.

1- Stratejîya geşepêdana aborî ya xwecihî

Ji bo bicihkirina guhertineke aborî ya berbiçav li herêmê, pêwîstî bi plansazîyeke stratejîk a xwecihî bi rêya stratejîyeke aborî ya geşpêdanê heye, ku armanca wê cîbicîkirina geşpêdaneke henseng a li herêmê ye, ji hêla aborî û civakî ve. Ev yek bi rêya xwesipartina li çavkanîyên xwecihî û xweser di serî de pêkan e, da ku zemîneke guncaw ku di paşerojê de karîbe weberhênanan ber bi herêmê ve bîne ava bike, bi rêya dê lawazîya karîna Rêveberîyê ya darayî were dabînkirin û projeyên mezin bîn cîbicîkirin, nemaze projeyên binesazîyê ku sermayeke mezin dixwazin, û ne Rêveberîya Xweser û ne jî biznizmanên xwecihî dikarin peyda bikin.

• Stûnên stratejîya geşpêdana xwecihî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê

Her stratejîyeke geşpêdanê hewl dide sûdê ji taybetîyên aborî, civakî û ekolojîk ên liberdest bibîne, heta radeya ku bi rêya wan derfeta bihêzkirina şîyanên xweser ên ku dikarin geşbûneke bilind bi xwe re binin û pêşketina xwestî li herêmê bi cih bikin. Pê re jî, hevsengîya cograffî û ekolojîk pêk tê û ne-hevsengîyên di hundirê aborîya xwecihî de kêmkirine. Lewra, em dikarin hin sîyaset û rêkarên ku bi rêya wan em dikarin stratejîyeke aborî li herêmê bidin ava bikin, bibîr bixin, ew jî ev in:

- a- Parastin û weberhênan çavkanîyên aborî yên li herêmê, kêmkirina xerckirina bermayîyên ku bi pirosesên berhemanîna wan ve girêdayî ne, û bikaranîna wan ji bo xizmetkirina beşên berhemdar ên ku dikarin rêjeyên geşbûnê, peydakirina derfetên kar û çêkirina nîrxê zêde baş bikin.
- b- Bipêşxistina jîngeha kar û weberhênanê û afirandina hemû faktor û bîngehên ku rewşa weberhênanê baş dikin, da ku rêjeya weberhênanê bipêş bikeve, nemaze weberhênanên çandinî û pîşeyî.
- c- Cihêrengkirina bîngeha aborî bi rêya sektorên sereke di nava aborîya xwecihî de û pûtepêdan bi pîşeyên pêşeng ku dikarin torekê ji hevgirtinên pêşî û paşî biafirînin. Di encamê de tevgerek di hundirê sektorên cuda de bi xwe re tîne ku çalakîyê zêdetir dikin û rêjeyên geşbûna aborî ber bi jorê ve dibin.
- d- Pûtepêdan bi bipêşxistina çavkanîyên mirovî, nemaze yên di bewarê îdarî û aborî de dixebitin, bi rêya xurtkirina rola sazîyên rahênanan ên fermî û

- bicîhkirina planên rahênanên pêşketî ku dikarin asta jêhatîbûna îdarî yan jî berhemdayîne ya xebatkaran bilindtir bikin, ev ji alîyekî ve. Ji alîyekî din ve jî pêkanîna lêkolîneke serjimarî bi armanca naskirina pisporîyên pîşeyî û yên xwedî zanîna xwestî, her wiha berxweve-anîna kesên pispor û xwedî karînen zanistî û xebatkarî ku karîbin prosesa geşepêdana aborî di vê qonaxa hesas û dîrokî de li herêmê bi rê ve bibin.
- e- Tiştên ku ji bo baştirkirina astên kar û performansa sektora çandinîyê û zêdekirina dahatên tê de hene, nemaze dabînkirina pêdivîyên hilberînê, hêmanên enerjîyê yên pêwîst û dermanên çandinî û beytarî yên pêwîst, bi armanca başkirina rastîya vê sektora jîyanî û girîng û pêşxistina wê.
- f- Rêvekirina li ber sektorên taybet ji bo sazkirina projeyên piçûk û navîn li ser asta yeksektorî, yan jî belavkirina wê di nava sektorên aborî yên cihêreng de, nemaze yên hilberînê û teşwîqkirina wan, da ku di nava prosesa geşepêdana aborî de bibin hevbeş, her wiha ji ber ku dikarin asteke bilind a geşbûnê bi xwe re bînin û derfeta kar peyda bikin, di encamê de dê barê darayî û aborî ji ser milê sazîyên Rêveberîya Xweser sivik bibe û giranî bo projeyên stratejîk li herêmê bê dayîn.
- g- Dabînkirina barhilgirên enerjîyê yên bi kalîte û bihayên gunçaw, ji bo xebitandina kargeh û projeyên çandinîyê û vejandina beşên aborî û civakî yên mayî li herêmê, ku dê bi erênî li ser çalakîya aborî nîşan bide û asta kar û xebatê karbidestîya aborî ya sektorên cihêreng baştir bike.
- h- Rakirina kêşeyên curbicur ên ku rê li ber destpêkirina proseya geşepêdana aborî digirin, û dabînkirina jîngeheke gunçaw jê re, çî îdarî, çî aborî û heta civakî be, ew jî bi nûjenkirina formên rêxistinî yên girêdayî proseya geşepêdana aborî, û baştirkirina jêrxanê, xizmetên rê, veguhestin, û pêwendîyan.

Du- Gavên sazkirina planên xwecihî yên stratejîk

Rewşa aborîya li herêmê bi nebûna planên geşepêdana stratejîk tê nasîn, îcarê li vir mirov dikar li ser vî esasî bernameyekê yan jî çarçoveyekê destnîşan bike û li gorî wê gavên erênî di milê geşepêdana aborî civakî bavêje, ew jî di serî de bi rêya çavkanîyên aborî û mirovî yên xwecihî, her wiha bi beşdarîya rêxistinên ne-hikûmî yên li herêmê.

Lê gelo gavên herî girîng, û li gorî rewşa aborî û civakî ya herêmê, yên plansazîya stratejîk ku mirov bi rêya wan bernameyên geşepêdana aborî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi cih bike çî ne?

1- Gava yekem: Avakirina tîmeke taybet bi prosesa geşepêdana aborî

Pêvajoya geşepêdana aborî hewce dike - di serî de - dabînkirina kadroyek îdarî û aborî yekgirtî di asta sazûmanî de, ku jêhatî û karibe hewil û şîyanên heyî yê di nav aborîya herêmî de birêxistin bike, çî ew sektorên girêdayî sazîyên Rêveberîya Xweser bin, çî jî sektorên Sivîl, yan yê girêdayî rêxistinên sivîl, yan jî rêxistinên civaka sivîl bin, ji ber ku pêvajoya geşepêdana aborî pêvajoyeke yekgirtî ye, nabe ku li ser sektoreke taybet bisekine, lê belê ev pêvajo pêwîstî bi hevgirtinê heye. hewlên hemû beşên navborî, ji bo bidestxistina armancên ku dê bi awayekî rast û objektîf ji alîyê tîma aborî ve bî xêzkirin e, ku ew jî dê proseya dabeşkirina karên sereke, di çarçoveya stratejîyên destnîşankirî de, pêk bîne. Nemaze strukturên rêxistinî ji bo plansazîya stratejî, bi awayekî ku cûreyek hevkarîyê di navbera sektora taybet û sektora sazîyên girêdayî Rêveberîya Xweser de, li ser bingeheke rêkûpêk û qanûnî yê zelal, çêdike, da ku faktorên geşbûnê bimeşîne û wan li gorî armancên pêvajoya pêşketina civakî-aborî handan bike.

2- Gava duyem: Avakirina bingeheke datayî ji aborîya xwecihî re û nirxandina rewşa heyî.

Ji alîyê ve, mijara dîyarkirina taybetmendîyên aborî li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyayê pir girîng e, ew jî ji bo naskirina sazûmanîyên aborî û îdarî yê heyî, û rola wan di pêvajoya pêşketinê de, û destnîşankirina milên sereke yê ku dikarin bibin alîkar di gihandina pêvajoya pêşketina aborî de.

Ji alîyê din ve, gerek e taybetîyên sereke yê aborîya xwecihî bî destnîşankirin û rewşa heyî bî nirxandin bi rêya danehevî û peydakirina datayên pêwîst û destnîşankirina awa û rêyên rêbazên sereke ku bernameya geşepêdanê di wan de dê were çîbicîkirin. Her wiha destnîşankirina têkilîya di navbera sektorên cihêreng jî ji alîyê ve, û ji alîyê din ve di navbera sazîyên Rêveberîya Xweser, nemaze di milê dabeşkirina çalakî û erkên stratejîya geşepêdanê û birêkirina wê.

Ji alîyê din ve, ji bo vê gavê pêwîst e, datayên jimarî yê pêwîst di derbarê nîşangerên aborî de bî peydakirin, nemaze nîşangerên aborîya giştî, bi armanca avakirina bingeheke datayan a hevgirtî ku ji bo analîzkirinê vekirî be, her wiha ji bo ku ji danîna planên geşepêdanê yê pêserojê re alîkar be, di nav de cihêrengî û xurtkirina bingeha aborî û berhevanîyê û çîbicîkirina projeyên pêşketî. Li rex vê yekê, gerek e hemû

xalên bihêz û yên lawaz di hundirê aborîya xwecihî de bên destnîşankirin ew jî bi armanca xurtkirin û bipêşxistina yên bihêz û jinavbirina yên lawaz di ber xizmeta bipêşxistina prosesa geşepêdana aborî li herêmê.

Li vi rem dikarin hin mînakên di derbarê nirxandina aborîya xwecihî de bidin:

-Xalên bihêz: Rûberên çandinîyê yên berfireh, peydabûna çavkanîyên aborîyê, nemaze gencîneya binerd weke petrol û kazê, peydabûna karkeran û beşdarîya jinê li meydana xebatên aborî.

-Xalên lawaz: Nebûna hevgerîtinê di navbera sazî û rêxistinên di warê aborîyê de, binesazîya jihevketî, zêdebûna bêkarîyê, lawazîya berhemdarîya kar û zehmetîya di peydakirina teknolojîyaya pêşketî de.

-Derfet: Bipêşxistina awayên berhemdarîya çandinîyê, danîna qanûnên birêxistina xebatên aborî û yên ji bo prosesa geşpêdanê handan in, her wiha sazkirina projeyên piçûk û navîn, encamên xwendina bilind ên nû, û bicihkirina sîyaseta berdêlên hawirdeyan.

-Gef: Berdewamîya koçberîya ciwan û şarezayan, rewşa xwendinê û stratejîyên perwerdeyê, pirsgerêkên nirxê pevguhertinê, nebûna sîstema bankî û zehmetîya dabînkirina teknolojîyê bo herêmê.

Bi rêya vê prosesa han êdî nirxandineke gunçaw ji aborîya xwecihî re û destnîşankirina taybetmendîyên wê yên sereke pêkan e, ew jî di ber misogerkirina çalakîya plansazîya stratejîk de, û pêşkêşkirina lêkolînan û dahûrandina gunçaw a plankirin û cîbicîkirina projeyên geşepêdana aborî, ku di encamê de dê bikeve xizmeta bipêşxistina rewşa aborî û civakî ya heyî li herêmê, her wiha dê rêya weberhênanê ber bi herêmê ve hêsantir bike ku dikarin sûdekê bidin aborîya xwecihî ji alîyekî ve, û ji alîyekî din ve dê feydeke gunçaw jî ji alîyekî din ve bi xwe re bîne.

3- Gava Sêyem: Plansazîya stratejîya xwecihî

Ji prosesa geşepêdana xwecihî re amadekirina stratejîyeke destnîşankirî pêwîst, ku gerek e armancên sereke yên prosesa geşepêdana xwestî berî her tiştî li ber çavan bistîne, her wiha xwe bispêre encamên prosesa nirxandina aborîya xwecihî, dahûrandina nîşangerên sereke yên halêhazir û destnîşankirina yên armancgirtî di çarçoveya aborîyeke pêşketkî de, ku berjewendîyên tevaya alîyên çalak di hundirê aborîya xwecihî û sektorên wê de li ber çavan bistîne, da ku rêjeya geşbûnê bilindtir bike û xweşîya aborî bi cih bike, pê re, dê hevsengî di nava stûnên geşepêdanê yên sereke de, her weke yên aborî, civakî û ekolojî de bi cih were.

Her wiha gerek e ev stratejî, alîyên sereke jî bigire nava xwe, her wekî nêrîn, name, armanc, navgîn û alavên kar, û destnîşankirina bernameyên geşepêdanê yên ku dê dest bi wan bike, û danîna çarçoveyeke demkî ya guncaw ji bo cîbicîkirina projeyên geşepêdanê di nava planeke stratejîk a hevgirtî de.

4- Gava Çarem: Qonaxa pratîk û cîbicîkirinê

Piştî destnîşankirina nêrîn, armanc û alavên stratejîya geşepêdana aborî, êdî gava duyem tê ku ew jî cîbicîkirina wê stratejîyê bixwe ye, ev yek bi rêya danîna planeke giştî ya prosesa geşepêdanê, destnîşankirina rêkar û sîyasetên cîbicîkirinê û destnîşankirina projeyên sereke bi rê ve diçe, lê li gorî rêza pêşinan û destnîşankirina pêwîstîyên wê û çavkanîyên piştgirîya wê ya darayî ye, her wiha rêjeya destkeftîyên pêşbînî û hêmanên sereke yên ku divê peyda bin ji çavkanîyên aborî, piştgirîya darayî, çavkanîyên mirovî, strukturên îdarî, û ofîs, ku weke xwestekine bingeînên prosesa geşepêdana aborî û ji bilî wan tînan zanîn, ew yek di çarçoveyeke zelal de, da ku aborîya xwecihî ber bi pêşketinê û geşbûnê ve biçe.

Her di vê qonaxê de, danîna planên kar li ser asta şax û sektorên aborî yên curbicur, îdarî û cîbicîkar, ji bo karkirina li ser rêvebirinê û hevahengkirina pêkanîna stratejîya geşepêdana aborî, bi rêya karîna û şîyanên berdest, û armancên ku di heman çarçovê de hatine danîn, pêk tîne. Helbet ev yek xebateke mezin a ji alîyê hemû xwedîyên pîşe, sazî, deste û kesan ve ji bo bicîkirina vê stratejîyê dixwaze, pêwîstdara bingeîn û pîvanên lazim yên ji bo lidarxistina vê prosesê û paşê nirxandina ye, ew jî bi armanca bichanîna bilez a encaman û sererastkirina şaşî û jirêderketinên ku dibê di dema cîbicîkirinê de derkevin holê, her wiha da ku rê li ber şûnmayînen neyînî bê girtinê û encamên xwestî bînin bidestxistin.

5- Gava Pêncem: Lêvegerîn û nirxandina stratejîya geşepêdana aborî

Bê guman biserketina her stratejîyeke geşepêdana aborî pêwîstîya xwe bi danîna sîstemeke zelal a pîvan û qîyasan heye, ew jî bi armanca piştrastkirina bilez ji lihevhatina encam û destkeftîyan pev re bi armancên ku berê hatine danîn, ev yek bi rêya lêvegera mekanîzmeya cîbicîkirina bername û sîyasteyên hatine danîn, her wekî alavên cîbicîkirina stratejîya geşepêdanê, pêk tê.

Li vir, hêjayî gotinê ye, ku prosesa lêvegerînê û nirxandinê proseseka berdewam e, ji cîbicîkirina palan, bername û projeyên stratejîya

geşepêdanê dest pê dike, ne ku piştî bidawîbûna wan. Ew jî bi rêya daneberhevîya astên destkeftî û encamên li ser erdê pêkhatî bi ewên di nava plana kar û berhemanînê de hatine danîn. Nirxandin ne tenê bi rêveberîya aborî ya li herêmê, yan jî bi wan dezgehên îdarî yên ku berpîrsê cîbicîkirina bername û pirojeyên geşepêdanê ne ve girêdayî ye, belku divê piranîya alîyên civakê beşdarî amadekirin û cîbicîkirina stratejîya geşepêdanê bibin û piştî şopandin û nirxandin dest pê bike. Ev yek ji bo ku bi awayekî rasterast li şaşîti û jirêderketinan were sekinandin û paşê çî şaşîti hebin bîn sererastkirin. Li alîyekî din gerek e nîşaneyên projeyên geşepêdanê bi awayekî zelal bîn hûnandin da ku rê li ber daneberhevîyê bê vekirin, tiştên dikevin nava projeyê û jê derdikevin li gorî ku hatiye plankirin û rola wê ya di cîbicîkirina bernameya geşepêdanê bi awayekî giştî, bîn pîvan.

Meseleya lêvegerîn û nirxandinê ji bilî şopandin û çareserkirina jirêderketin û prosesên pîvanê, gelek alîyên din jî digire nava xwe ku bi bernameya geşepêdanê ve girêdayî ne, ku ew jî bi rêya vekolîn û lêkolînkirina bandora wan a li ser girûpên berarmanc û bandora cîbicîkirina bernameya geşepêdanê li serê, her wiha daneberhevîya rewşên wan di qonaxên berîya prosesa cîbicîkirinê ya wan bernameyan bixwe, pêk tê. Ev yek bidûrî karvedanên derveyî yên wan bernameyan di hundirê aborîyê de, lê di çarçoveya lêçûna pêşbînîkirî ya prosesa geşepêdanê, ku ew jî gerek e destkeftî û fêdeya wê ji ya lêçûnê bilindtir be.

Encam û Pêşinyar

Yek- Encam

Ji bo geşkirina herêmê û başkirina rewşa aborîya wê, gelek erk dikevin ser milê Rêveberîya Xweser de, ji ber ku gelek xebat divin, pêwîst e planên geşepêdanê bîn danîn, binesazîya weberhênanê were amadekirin û sazûmanîya îdarî ya warê aborî ji nû ve bê birêxistinkirin, li ser bingehe saxlem ku bi rewşa sîyasî û aborî re bigunce û çavkanîyên liberdest bi awayekî çalaktir li ser esasê sazîyan bîn bikaranîn, ku kualîte û çalakîya aborî ya xwestî bi xwe re bîne.

Bi rêya vê lêkolînê gelek encam derketin holê, ew jî ev in:

- 1- Aborîya xwecihî li qadên Rêveberîya Xweser ti taybetmendîyeke xwe ya zelal nîne, tevî ku felsefeya Rêveberîya Xweser taybetmendîya aborîya

civakê dide pêş. Lê rewşa sazî û sîyasî hîn jî piraniya aliyên aborî yên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyayê kontrol dike, û ev yek nakokî di navbera sîyaset û mekanîzmeyên heyî û felsefe û dirûşmên rêveberîyê yên derbarê warê aborî de derdixe holê.

- 2- Rêveberîya Xweser - heta niha - ne xwedîyê tîma xwe ya aborî ye, û li gorî wê jî ti stratejîyên wê yên geşepêdana aborî yên rast nînin, ku aborînas bikarin ava bikin. Tiştê ku li ser erdê diqewime ew e ku Rêveberîya Xweser tenê bi erkê birêvebirina hin karên aborî li herêmên xwe radibe, wek karên bazirganî û çandinîyê, û avakirina hin projeyên pîşesazî yên piçûk.
- 3- Ji bo pêkanîna rewşeke geşpêdanê ya li herêmê, gelek çavkanîyên aborî yên têrker li herêmên Rêveberîya Xweser hene, lê ti nêrîneke stratejîk a Rêveberîyê di derbarê wan de tune ye, her wiha li rex wê yekê , ti birêveberîyeke aborî ya hevgirtî ku karibe planên geşpêdanê deyinê û sîyasteyên pêwîst li ser erdê bi cîh bîne jî tune ye.
- 4- Heta niha Rêveberîya Xweser nedikarî encamine aborî yên baş bi dest bixe, tevî çavkanîyên cihê reng ku di destê wê de ne, her weke petrol, gaz û rûberên çandinîyê yên berfireh. Em dikarin sedema vê yekê wiha rave bikin: rewşa ewlekarîyê ya li herêmê, awayê aborî yê ku Rêveberîya Xweser pê difikire yan nebûne pisporên xwedî tecrube li navenda biryarî ya geşpêdanê, her wiha bargiranîyên giran yên darayî li ser milê Rêveberîya Xweser, bi taybet di milê leşkerî de, nemaze di vê qonaxa nêrîna a ku tevaya welêt tê re derbas dibe û di serî de herêmên Rêveberîya Xweser.
- 5- Mekanîzmeyên xebatên Rêveberîya Xweser di warê aborî de gelekî bi rewşa ewlekarîyê û rewşa sîyasî bi bandor dibe, ev yekî dihêle ku bandorên neyînî li sîyaseta aborî li ser asta hizirîna stratejîk li herêmê bibin. Îcarê, li gorî wan encam û bandoran di nava sînorên îdarî de tev digere ku nahiye asta planên demdirêj an yên navîn.
- 6- Rêveberîya Xweser - bi tena xwe - û bi derfetên xwe yên darayî yên heyî, nikare pêvajoya geşpêdana aborî bide destpêkirin, ji ber vê yekê divê di warê aborî de sektora taybet û hêzên civakî yên aktîf, wek sendîka, yekîtî û rêxistinên civaka sivîl, beşdar bike. Ji bo amadekarîyên vê rewşê bikin û pêşî beşdarî pêşniyarkirina pîlan û sîyasetên pêwîst li ser bingeha rastîya aborî ya rastîn bibin, û paşê beşdarî cîbicîkirina wê bibin, her yek li gorî qada kar û hebûna xwe, bi armanca bilindkirina rêjeya geşbûna aborî, û amadekarî ji bo prosesa pêşveçûnek berfireh re.

- 7- Di warê aborî de, pêwîstîya Rêveberîya Xweser bi kadroyên pispor, lêkolîn û vekolînên akademîk ên aborî heye, lewra her xebatên wê bi asta biryarên îdarî ve girêdayî ne, ew jî ji bo sazîkirin an birêvebirina projeyên aborî. Helbet ev yek di encama neguhdana pêwîst a bi dosyayên plansazîya aborî û danîna stratejîyên misoger yên bipêşxistinê de ye.
- 8- Kêmrastgoyîna Rêveberîyê û belav-nekirina ti nîşaneyên aborî, nameze yên ku weke jêrzemîneke pêwîst a ji plan û sîyasetên pêşerojê re, her wekî asta berhemdayîna xwecihî, rêjeyên bêkarîyê, astên enflasyonê, qebareya bazirganîya derveyî, amadekirina projeyên berhmdar, qebareya destekdayîna sektora taybet di hilberîna xwecihî de, û ji bilî wan ji nîşaneyên pêwîst ku hewcedarê dahûrandinê û danîna encaman in, da ku ji plansazîya pêşerojê re bibe zemînek.

Du- Pêşinyar

Li gorî vekolîn û encamên lêkolînê, hin pêşnîyar dikarin werin pêşkêş kirin, ku nêrînekê li ser projeya geşepêdana aborî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêşkêş dikin. Ew jî ev in:

- 1- avakirina tîmeke aborî ji akademîsyen, pispor û kesên xwedî ezmûna meydanî di warê geşepêdana aborî de û dayîna desthilatên berferêh ji bo xebata serbixwe, bi armanca vekolandina rewşa aborî ya rastîn û nîşaneyên wê yên sereke û karkirina li ser avakirina stratejîyek pêşkeftinê ya zelal ji bo herêmê, li ser bingeheke zanistî yên zexm.
- 2- Divê rola ofîsên ku planan dideynin were aktîvkirin û di qadên aborî de girîngî bo wan bê dan, her wiha çavdêrkirina nîşaneyên sereke da ku bi rola xwe ya çalak di dahûrandin û danîna sîyasetên aborî de bilîzi, ew jî bi armanca bipêşxistina rewşa aborî li ser bingehine raste û li gorî nêrîneke stratejîk a aborî.
- 3- Avakirina dezgehên îdarî yên girêdayî karûbarên aborî û dabeşkirina erkan di nav wan de li gorî bingehên zanistî û pisporî yên saxlem, û li ser esasê pîrensîpa hevahengîya di kar de, ku astên rastîn ên destkeftan garantî dike, û alîkarîyê di nirxandin û çavdêrîyê de dike, ew jî bi rêya sînordarkirina karê aborî û projeyên wê ji bo her alîyekî cuda.
- 4- Divê tîmê aborî stratejîyeke geşepêdanê ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re deyin, ku li gorî rewşa heyî ya herêmê û taybetmendîyên wê yên aborî û sîyasî be, her wiha armanca wê jî gerek e bikaranîna guncaw a çavkanîyên aborî yên liberdest be û terxankirina wan di ber xizmet û bipêşxistina herêmê ji hêla aborî ve û başkirina rewşa jîyanî be.

- 5- Karkirina li ser bipêşxistina planên aborî li ser asta sektorên sereke yên aborî, li ser bingehê yekgirtî û di çarçoveya planeke aborî û rênîşanderî ya giştalî de, û vekirina derî ji bo beşdarîya sektora taybet di pirosesa berhemanînê de, bi armanca dabînkirina sermayeya pêwîst ji bo weberhênanê ji aliyekê ve û pirrengkirin û bihêzkirina bingeha berhemanînê ji aliyekî din ve, ku dê derfetên kar peyda bike, û weberhênan zêde bike, û bi vî awayî qebareya berhema navxwe zêde bibe, û rêjeya geşbûna aborî jî bilind bike.
- 6- Guhdan û pûtepêdan bi planên aborî yên berhemdar di sektorên çandinî û pîşesazî yên dahatî, ew jî ji ber rola wan a girîng di zêdekirina berhemanîna xwecihî bi giştî de, û afirandina nirxekî zêde, peydakirina kelûpel û madeyên pêwîst ji bazarê re, başkirina astên ewlehîya xwarinê li herêmê û dabînkirina derfetên kar û dahata xelkên herêmê, ku Rêveberîya Xweser di rojên pêş de nikaribe bi barê wan kar û peywiran raibe.
- 7- Erka belavkirina nîşaneyên sereke yên aborî ji bo Buroya Pilandananê, wek desteyek fermî û pispor di karûbarên stratejî û plansazîya aborî de were spartin, li ser esasê şefafiyetê, ku wêneyekî zelal li ber çalakîyên curbicur ên aborî dîyar dike. Her wiha ku nîyeta wan heye di warê berhemanîn û xizmetguzariyê de kar bikin, çî ji sektora îdarî ya sazîyên bi ser Rêveberîya Xweser ve bin, çî ji gelek beşên din ên sivîl, bi taybetî jî sektora taybet û rêxistinên civaka sivîl bin.
- 8- Derxistina yasa û rêkarên taybet bi rewşa aborî bi awayekî bilez, bi armanca hazirkirina binesazîya weberhênanê û çalakkirina wê, ku dê bi xwe re sermayeyên taybet çî li ser asta xwecihî û çî ya derveyî bîne, bi vê yekê dê tevgera weberhênanê li herêmê çalak bibe, proje zêde bibin û berhemanîna xwecihî geş bibe, her wiha dê derfetên kar û dahat zêde bibin. Ev hemû dê başkirina nîşangerîyên aborî li herêmê û asta başbûna jîyanê bi xwe re bînin.

Di dawîyê de...

Em werin rastîyê, halêhazir, civaka li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi welatî û hikûmeta xwe, rûbirûyî gelek kêşeyên aborî, sîyasî û leşkerî ne, her wiha gelek derfet û berpirsyartî li pêşîya wê hene ku gerek e bihêlin bêhtir bixebitin û kar bikin û rê li ber kirîz û pirsgirêkên aborî bi awayekî zelal û zanistî bigirin, da ku jîngeheke aborî ya ku bi pêşketin û geşbûnê re diguncew peyda bike û jîyaneke birûmet ji tevaya xelkên herêmê re dabîn bike.

Serkeftin û pêşvebirina rewşa aborî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, pêwîstî bi xebatên hevbeş ên alî û beşên aborî di asta îdarî û aborî de, û beşdarîya alîyên cuda di danîna planan û pêkanîna sîyasetên aborî de heye. Her yek ji cihê xwe, bi awayekî ku garantîya karekî komîn û yekgirtî dike, bi armanca sûdwergirtina ji çavkanîyên herêmê, û dabînkirina jîyaneke guncaw ji welatîyên xwe re, li beramberî qeyranên aborî yên giran ku Sûrîya tê re derbas dibe, û bilindbûna rêjeyên enflasyonê, ku bandora wan qeyranan li herêmê, û li rewşa kar, berhemanîn, xerckirin, şîyanên darayî yên xwebirêvebirinê û nirxa bilind a geşepêdana aborî li navçeyên wê heye.

Ji ber ku sîyaseta plansazîya stratejî di çarçoveya geşepêdana domdar de xwedan pozîsyonek pir pêşketî ye, ev yek ji biryarderan re hewce dike ku ber bi dariştina planek aborî ya berfireh, li ser bingeha planên jêr-sektorî, û di nav stratejîyek geşepêdana aborî ya zelal de bi armanc û nêrîneke paşerojî re bimeşin. Ew jî bi mebesta ku aborîya xwecihî li ser rêça geşepêdana saxlem bimîne, ku bêyî vê yekê herêm dê di rojên pêş de tûşî qeyran û xeniqandinên ku encamên wan nayên efûkirin, bibe.